LIYONARDO DAVINŞÎ 1452- 1519

Nivîsan: Anna C. Krausse
Berhevkirin û wergêran ji Înglîzî:
Ebdirehman Zêweyî
û Ehlam Ebdela

Liyonardo Davinşî, ne bes di warê nîgarê de, dahêner û bi nav û deng bûye, belê hind serkeftî bûye di zanistê siruştî, teknolojiya û hunerê bînesazî de. Hevçerxên wî bi jîrî û bilîmetiya wî daxbar bûyne. Wê çendê jî, handaye çendîn pêrabûn, lêkolîn û xwendinan bike. Bi behremendî têbîniyên xwe bo siruştî ya ku sîmayên mijarî, hişyarî û di navbera sozê de têkel kiriye, da bo xwe rêkekê durist bike bo hunerê riyalistî. Tabloyên wî kartêkirin li ser karên çendîn hunermendan bo çendîn çerxan kiriye.

Tabloyê "Mizgînî" despêka karê wî bûye"Miryem el ezra" tê de nîgar kiriye, ew jî sala 1417 ê.

Şêwazê wî cuda xuya ye ku rûdan li ber dergehê xaniyê "Miryema keç" rûda ye, ji berku dem elind e, gul û giya geş in, dîwar dorpêçkiriye, dîmenê siruştî yê daristanê tejî dar û gir in û di nîva tabloyê de, ewê dikeve beşê serî Cibrîl bi cilkên sor hatiye nîgar kirin, xwe beranber "Miryema keç" çemandiye, bi nameyekê ji dev Xwedê, mizgîniyê digehîne. Bi giyanê sivik û aza "Miryema keç" bersiva namê dide.

Liyonardo, di vê tabloyê de, viyaye derbirînê ji giyanê ji nav da bike, bi serûçavên nerim û pirça hatiye xwar. Liyonardo "Miryema keç" nîgar kiriye bi tinê havandine bo ciwaniya jinkê ya nimûneyî.

Sala 1482 ê çûye Mîlan wek nîgarkêş li dev dewrûberê şahî karkiriye, wek binyatdanan û dahîner bo amîrên cengê û nexşekêş bo ahengên yên xêzana şahî di damezrandin. Her çend şiyan û jîriya wî di biwarê nexşekêşana endazyarê û dahênanan de, wek nîgarkêş hate damezrandin, ew salên li Mîlan akincî bûy û desthelat hate dan, gelek tabloyên ayînî yên taybet bi Tewratê ve raperandin.

Demê hêrişbirina Firansa bo Îtalyayê sala 1499ê, Liyonardo hate dîlkirin; ji ber wê rûdanê û têkçûna yên bi ser xêzana desthelatdar de hatî "xêzana Sforza li Mîlan". Di wî demî de bi borîna çendîn salan, Liyonardo hest pê kir jiyaneke necêhgîr dijît. Heyirî di navbera Manto, Floranca, Roma, Mîlan û her wesa Parma dihat û diçû.

Tabloya “Manalîza”, bi dirêjiya jiyana wî, di navbera tabloyên wî de gelek bi navûdeng bû. Belku bi nav û dengtirîn tablo ye di mêjûya hunerî de. Her wesa nav lê hatiye dan, tabloyê "Giogondo" (ciyokondo).

Gelek pirsyar li ser vî tabloyî hatîne kirin, ku di sala 1503 ê de, hatiye dirust kirin, lê heta evro jî, bersiva wan pirsyara nehatiye dan. Ya êkê çi pênaseyek ji bo wê kesatiya wê jinka rûniştî nîne. Her wesa ew kesê gotî ku ev Portrîteya hevjîna paşa "Firsnsîsco"ye, pênasa wî jî, ne xuya ye. Ji ber wê çendê, çendîn raverkirin û şirovekirin di mêjûya hunerî de peyda bûn.

Liyonardo di vê tabloyê de, viyaye zêdetir weku wêne yan yawerekê siruştî be diyar bike.Wek diyar, wêne yê jinkeke xwedan çavên tijî nazikî û aştî ye. Ev wêne jî, derbirînê ji derûn û roha wê dike.

Liyonardo, li dev şah Gîcodo de Francîsco sala 1507 ê kar kiriye û li sala 1515 ê di gel şahê Firansa Francîsco çûye Firansa. Li wê derê bi beriztirîn pileya şanaziyê dihête raspardin û sala 1519 ê diçe ber dilovaniya Xwedê.